**Têbîniya girîng**

Dayîkbav û serperestên hêja

**Şarezabûna ser zimanê Almanî yek ji hokarên herî girîng bo serkeftina zaroka we li dibistanê ye.** Baş zanîna zimanê Almanî jî **bingeheke pir girîng** bo destpêka serkeftî li jiyana karî yan dibistanên navîn e.

**Li dibistanê**, zarokên zimanên biyanî bo hînbûna zimanê Almanî bi rêya xizmeta "Almanî wekî Zimanê Duyem" (Daz) piştevaniya kêrhatî werdigirin. Lê, em têgihîştine ku zimanê Almanî bi gelemperî tenê wê demê mirov bi qasî têr şareza dibe eger **zarok <u>bi qasî ku mimkin e pirtir pêwendiya</u> wan hebe digel Swîsa almanî yan Almaniya derveyî dibistanê**. Zarok girêdayî arîkariya we wekî dayîkbav / serperestên qanûnî ne! Loma em tewsiye dikin ku zarokên we ...

- ... pircaran bi zarokên almanî-zimanê re li dema xwe ya azad dilîzin (1).
- ... serdana malbatên Swîsa almanî yan Almanî-ziman yên mêvandar bidin s(2).
- ... bo firavînê û navendên muqateya piştî dibistanê li cihên ku piranî Almaniya Swîsê yan Almanî tê axaftin tên muqatebûn. (3)
- ... li dema xwe ya azad li klubên werzişî û muzîkê yên xwecihî yên Swîsê çalak in (4).
- ... li pirtûkxaneyê pirtûkên bi Almanî emanet werdigirin û dixwînin (5).

Temaşekirina sergermî ya fîlman û bernameyên televîzyonê bi Almanî dikare arîkariyê bide zarokan zimanê Almanî baştir têbigihîje. Lê bo ku zaroka we baş Almanî biaxive û ser zimên şareza be, temaşekirina fîlman û bernameyên televîzyonî bi Almanî bi tu awayî bes nake! Xalên jorê hatin gotin 1-5 bandora wan gellekî baştir e!

Di bingehê de, hînbûna Almaniya Swîsê yan Almaniyê beriya çûyîna zarokistanê pir hêsan e. Eger hîn jî zarokên we di vî temenê hene, xalên jorê hatin gotin 1-3 jî bo zarokên we yên piçûk gellekî girîng in.

Gellekî sipas bo berçavgirtina van zanyariyan ku bo pêşeroja zarokên we girîng in.

Dibistana Civakê ya Horw